Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 85
15'ê Nîsanê
Buha: 150 Tûmen

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Girûpek Ji Terorîstên Kurd Yên Ensar Îslam Ji Îranê Derbazî Axa Îraqê Bûne

Li gor agahiyên rojnameya Hawlatî'yê hejmarek çekdarên Kurd ên ser bi girûpa terorîstî a Ensar Îslam ji bo encamdana teqînan û şer ji Îranê ve hatine herêmên Mendelî û Seîdiye li Îraqê.



Hevpeyvîna ROJNAME'yê Tevî Rêzdar Mistefa Hicrî 2

Komkujiya Gêçê



5

Sedemên Jordeçûna Temenê Zewacê




7

Qamişlo... Ber Bi Dîrokê Ve




9

Salih Heydo ( Enistîtuya Gerok )



10

Dîrokzan Cemşîd Bender Wefat Kir



11

# LÎ NAVENDA 3 YA KURDİSTANÊ CİVÎNEKE BERFİREH Jİ BO SEKRETERÊ GİŞTÎ YÊ PDK ÎRANÊ HATE LİDARXİSTİN



Ji aliyê çepê ve: Ehmed Rehîmî, Mistefa Hicrî û Mihemedsalih Qadirî

Roja pêncşem, 10.04.2008'an, **Mistefa Hicrî**, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di seredanekê de ji bo Navenda 3 a vê partiyê civînek tevî nûnerên Komîteyên PDK Îranê li bajarê Hewlêr, Soran, Kampa Kawe û Cêjnîkanê pêk anî.

Di destpêkê de **Mihemedsalih Qadirî**, endamê Komîteya Navendî a PDK Îranê û berpirsê Navenda 3 a Kurdistanê bixêrhatina Mistefa Hicrî û endamên vê partiyê kir û piştre daxwaz ji Sekreterê Giştî yê partiyê kir ku axavtina xwe pêşkêş bike.

Mistefa Hicrî bi berfirehî li ser rewşa niha a Komara Îslamî di asta navxweyî û derve de axivî û bal kişande ser çalakî û pêngavên erênî yên PDK Îranê û kar û xebatên vê partiyê di sala borî de û pirsên han bi hûrî û berfirehî ji beşdaran re şirove kir.

Piştre beşdarên civînê pirs, rexne û pêşniyarên xwe anîne berbas û di dawiya civînê de, ji aliyê Kek Mistefa Hicrî ve bersiva pirsiyarên wan hate dan.

**Bûş:**

# "Îran Û El Qaîde Gefên Herî Mezin Ên Sedsala Me Ne"



Çend rojan berî niha Corc Bûş, Serok Komarê Amerîkayê li ser rewşa Îraqê axavtinek girîng kir û Îran li rex Rêxistina terorîstî a El Qaîdeyê weke gefên herî mezin li dijî Amerîkayê di sedsala 21'an da da zanîn û got: " Ev du alî hêviya têkçûna Amerîkayê di Îraqê de dikin".

Serok Komarê Amerîkayê berê jî ragihandibû ku heke Komara Îslamî li dijî armancên Amerîkayê li welatên cîran derkeve, ew dê zor û zextê bikar bînin.

Bûş Îranê bi piştgirî ji terorîstên hundirê Îraqê û xebat ji bo bidestxistina çekên Etomî tawanbar kir û got: "Îraq niqteya bi hev gihîştina du gef û hereşeyên mezin li dijî Amerîka di sedsala me de ne: **El Qaîde** û **Îran**".

Herwiha General Dêvîd Pêtrayûs, Fermanderê Hêzên Amerîkayê li Îraqê di rapora xwe ya hefteya borî ji bo Kongresa DYA'ê de diyar kir ku Îranê roleke xirab û têkder di Îraqê de heye. Wî got, Îran terorîstên Îraqî perwerde dike, pere û çek û teqemeniyê dide wan û Pasdarên xwe yê terorîst ji bo xirabkariyan dişîne hundirê Îraqê. Wî dewleta Komara Îslamî weke gefeke mezin bo ser ewlekariya Îraqê da zanîn û got Îran naxwaze aştî, demokrasî û ewlehî di Îraqê de cihgir be.

www.arsivakurd.org

# Hevpeyvîna Rojnameya “ROJNAME”, Tevî Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê

**Xwendevanên hêja ên Agirî, Rojnameya ROJNAME ku li Başûrê Kurdistanê diweşe, hevpeyvînek bi rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê re weşand, me ji ber girîngiya naveroka wê, hevpeyvîn bi Kurmancî amade kir.**

**Amadekar/Omîd Esxeran**

**Hin kesan jêve ne ku rikeberanêya di navbera reformxwaz û kevneparêzan di hilbijartina gerra heştemîn a Meclîsa Şêwara Îslamî a Îranê û gişt pêkhatiya wê rejîmê de, rikeberanêyek rastîn e, her wiha jêve ne ku baweriyê ne heke reformxwaz biryarder û desthilatdar bin, zirûfa siyasî a Îranê dê diguhere û heya qasekê dê demokratîze be. Bi giştî raya we derheq hilbijartina gerra heştemîn a Meclîsa Şêwra Îslamî di Îranê de çî ye û hûn rikeberanêya navbera reformxwaz û kevneparêzan di hilbijartinan de çawa dibînin?**

Di wan heşt gerrên hilbijartinên Parleman û her wiha hilbijartinên Serok Komariyê de ku ji destpêka desthilatdariya Komara Îslamî de hatine meşandin, eva ku em gişt xelkê Îranê dibînin, eva ye hilbijartinek ku em bikarin weke hilbijartina rastîn bihesibînin, di tu yek ji şanogeriyên han de nehatine birêvebirin, çunku tu yek ji merc û pîvanên hilbijartinek azad ku di welatên demokratîk de tên meşandin, di hilbijartinên han de nahên dîtin. Şêwra Çavdêr û betalkirina jêhatîbûna berbijaran ji aliyê navenda han ve, di rastî de diyarîkirina hin kesan ji bo rejîmê ye ku tu ferq û cudahiyek di nava wan de nahê dîtin. Eva bi vê wateyê ye ku hemû kesên ku nûnerên rastîn ên xelkê ne, berbijariya wan tê betalkirin û rejîm desteyek ji wan kesan dihêle ku bixwe nasiyarî li ser wan heye û hilbijartina wan ji bo rejîmê girîng nîn e, encama vê çendê jî yê bûye sedem ku roj li pey rojê asta beşdariya xelkê di hilbijartinan de kêmtir be. Merema min ji kêmbûnê eva nîn e ku Komara Îslamî hertim piştî her hilbijartinekê, piropagandayek zaf dike û wê serkevtî nîşan dide û wiha dide zanîn ku xelk pêşwazî ji hilbijartinan dike, bi taybet li gor hin zaniyariyên ku gihîştine destê me, di Kurdistanê de roj li pey rojê asta beşdarîkirina xelkê di hilbijartinan de kêmtir dibe. Mînaka herê dawîn hilbijartina wê dawiyê a gerra heştemîn a Meclîsa Şêwra Îslamî ye, ji aliyekî din ve jî, ji destpêkê ve heya niha Reformxwaz di Îranê de reformxwazên hikûmetî bûne, renge serdemê zêrîn yê reformxwazan, Parlemana Şeşem be, wê demê Xatemî



Serok Komar bû ku dezgeha birêvebirin û pirraniya Parlemanê jî di destê dewleta wî de bû, lê me mêze kir ku tu gavek berbi demokrasî û cihgirkirina wê nehate avêtin. Wan heta di piropagandayên hilbijartina gerra şeşem de jî wiha didan zanîn ku heke bigihîjin desthilatê, berî hemû tiştekê dê yasaya çapemeniyê ku ji aliyê rejîmê ve bi tevahî hatibû sînordarkirin, biguherin, her weke ku me dît dema ku hatin ser kar, bi fermaneke Xameneyî ku navê wê danîbûn **fermana hikûmetî**, dest ji wî karî hilgirtin û ji baskirina vê jî poşman bûn. Lewra em dibînin pirsa reformxwazan ku bi serokatiya Xatemî hate rojevê, piştî du gerrên çar salî a Serok Komariyê, îdî yê gihîşte dawiyê û dema vê biser çû. Wate baska han bi kiryar nîşan da ku nikare tu guhartinekê ku bi qazancê gelên Îranê û demokrasiyê be, di Komara Îslamî de pêk bîne, nemaze ku divêt hemû karek di çaroveya yasaya bingehîn a Komara Îslamî de were encamdan. Eva di demekê de ye ku yasaya han bixwe yek ji mezintirîn astengên pêşiya demokrasî û azadiyê ye. Lewra min jêve ye dawî bi serdemê reformê hatiye û kêberkêya di navbera reformxwaz û kevneparêzan kêberkêyek nîn e ku bibe cihê dilxweşiya xelkê, bi taybetî her weke ku em dibînin tu aliyek ligel azadî û bîr û rayên cuda û guhartin di Komara Îslamî de nîn e. Heke kêberkêyek jî di holê de be, zêdetir di nava desthilatxwazan de ye, her yek ji bo bidestveanîna desthilata zêdetir hewlê didin, ne ji bo azadî, demokrasî, mafê neteweyan û nehêlana zilma ku li ser gelên Îranê tê meşandin.

**Dewletên Yekbûyî ên Amerîkayê heya niha jî dijberiya Îranê dike û digel mana desthilatdariya bi vî awayî dijber e, gelo hûn weke PDK Îranê ku dijberê Komara Îslamî ne, derheq vê çendê bi awayekî eşkere pêwendî tevî Amerîkayê heye?**

Em weke PDK Îranê li ser vê baweriyê ne ku em Kurd bi tenê nikarin Komara Îslamî yan her hikûmeteke din ku di wî welatî de desthilatdar be, bihiloşînin. Bona vê çendê me pişt bi du fakteran girê daye: a yekem, xebat û tekoşîna xelkê Kurdistanê di hundirê welat de, bona vê çendê jî em karê organîzasiyon, ragihandin û eşkerekirina siyasetên rejîmê dişopînin û ya duyem jî eva ye ku ji bo gihîştin bi armancên xwe, em hewcedarê piştevaniya derve ne, piştevaniya han pêkhatî ye ji piştgiriya welatên demokrat û pêşverû ên cîhanê û yek ji wan Amerîka û renge di pileya duyem de jî Ewropa. Bi şopandina siyaseta han e ku me mêjdem e pêwendî tevî Amerîkayê hebûye û heye. Bi vî awayî di warê dîplomasiyê de, em xwediyê çalakiyên berçav li Ewropayê ne, eva ji bo vê çendê ye ku em bikarin deng û daxwazên neteweya xwe bigihîjînin navendên biryarder ên cîhanê û ji rêya han ve siyaseta partiya xwe bi wan bidin nasandin.

**Gelo pêwendiyên ku we tevî welatên han hene, bûne sedema pêşvebirina hin pirojeyan ku aliyê kêm Komara Îslamî di asta hundirê welat û herêmê de qels û lawaz bike?**

Ez li ser vê baweriyê me ku Amerîkayê heya niha siyaseteke rohn û zelal derheq Îranê nebûye, eva rast e ku Amerîka hin caran ji Îranê dixeyide, lê heta niha siyaseteke eşkere û ragihandî di holê de nebûye ku bo mînak bêje, em dixwazin digel Îranê wî karî bikin û bernameyekê bona vê çendê dabirêjin, lewra di vê çarçoveyê de, min jêve ye ne tenê partiya me, belku hindî ku ez dizanim Amerîka tevî tu yek ji partiyên opozîsyon ên Îranê pêwendiyek wisa tune ye ku digel wê de bername û pirojeyan dabirêje, ev pêwendiya ku me heye zêdetir pêwendiyekî siyasî û jihev têgihîştin e derheq zirûfekê ku di Îran û Kurdistanê de heye.

**Di êrîşa leşkerî a Aemerîka bo ser Efxanistan û Îraqê de, wiha dihat texmînkirin ku Amerîka dê heyamekî kurt piştî şerê Îraqê, êrîşa leşkerî bike ser Îranê, lê piştî bûyerên pêwendîdar bi êrîşên han ve, texmîna han lawaz bû. Balansa hêzan di herêm û cîhanê de, bandor li ser betalkirina raya han hebûye. Bi liberçavgirtina zirûfa han, êrîşa Amerîka bo ser Îranê heya çi qasekê nêzî rastiyê ye?**

Bi qasê ku me hay ji siyasetên piropagandayî ên Amerîkayê heye û ji destpêkê ve ku me eva şopandiye û di pêwendiyên ku me tevî wan hebûne, tu demekê me hajê nebûye ku bernameyeke wiha di holê de be ku ji rêya bejahî ve êrîşê bikin ser Îranê û modela Efxanistan û Îraqê di Îranê de jî bimeşînin. Li vir ez naçim ser sedemên vê çendê, renge derfetek zêdetir bixwaze, lê eva ku heya niha di holê de bûye, êrîşek berfireh bo ser navendên leşkerî ên Îranê bûye, bi awayekê ku hin navendên stratejî, aborî, leşkerî û rêyên pêwendian bi tundî bombebaran bike û zirarek mezin lê bike. Hetanî sala derbasbûyî egera han di rojevê de bû, lê her weke ku we jî îşare pê kir,

www.arsivakurdi.org

pirsa balansa hêz di herêmê de û ji bilî vê çendê, ez pirsa zêdebûna buhaya petrolê û hin fakterên din jî jê zêde dikim, bûn sedem ku Amerîka heya niha jî qala êrîş bo ser Îranê neke û egera vê çendê jî heya ku ji holê rabe. Min jêve nîn e Amerîka di zirûfekê wilo di Rojhilata Navîn de bixwaze karekî wiha encam bide, çunku di rewşeke wiha de, arîşeyên vî welatî û hevalbendên wî zêdetir dibin. Diyar e Amerîka weke yek ji welatên 5+1 hewlê dide ji du rêyên haydan û cezakirin ên Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Hevgirtî ve Îranê mecbûr bike ku dest ji zengînkirina Uraniyûmê hilgire û bi wî awayî gefa li ser xwe û bi giştî cîhanê ji holê rake. Siyasetek ku Amerîkayê niha girtiye pêşiya xwe, ji aliyekê ve haydana Îranê ye ji bo diyalogê û ji aliyekî din jî weke ku min got cezakirina wî welatî ye. Her weke ku me heyamekê berî niha dît biryara sêyem a Konseya Ewlekariyê li dijî Îranê derçû ku Amerîkayê rolek berçav di vê derheqê de lîst.

**Niha di Rojhilata Navîn de pêvajoya demokratîzekirina pêkhatiyên siyasî di jordeçûn û jêrdeçûnê de ye, em wiha bihesibînin ku pirojeya han heya astekê berbipêşve çû ku Komara Îslamî neçar bike di hundirê xwe de guhartinên demokratîk encam bide û zirûfek wilo were holê ku hewce be tevî Opozîsyonê danûstandinê bike, hûn weke PDK Îranê heya çi qasekê amade ne tevî Komara Îslamî gotûbêj û danûstandinan bikin?**

Her çend ku dibêjin di siyasetê de tu tiştek nemimkûn tune ye, lê di rastî de me bi liberçavgirtina nasiyariyek ku ji Komara Îslamî heye û azmûnek ku tevî wê rejîmê hatiye destê me, em hatine ser vê baweriyê ku rejîma Komara Îslamî bi tu awayekê tevî merc û pîvanên demokratîk nahê û nikare ber bi guhartinên demokratîk here. Sedema vê çendê jî vedigere ser vê rastiyê ku demokrasî di civak yan desthilata demokratîk de ber bi pêşve diçe, rejîmek ku xwe weke nûnerên Xwedê dihesibîne û jêve ye kar û xebatên wê, ji esman ketin û hêjayî destêwerdanê nîn in, li vir demokrasî tiştek nîn e ku were hizrandin. Derheq vê çendê, ji bilî Îranê, welatên din jî hene ku nekarîne tevî demokrasiyê ber bi pêşve biçin, ji bo vê çendê em dikarin Kureya Bakûr weke mînak bînin ku niha jî her di çarçoveya îdeolojîk a xwe de maye. Berê jî Yekîtiya Soviyetê hebû ku nekarî tevî demokrasiyê bijî, her wiha welatên Kûba û Taliban ku derfeta encamdana guhartinên demokratîk di rejîmên han de nîn e. Komara Îslamî jî yek ji wan sîstemên îdeolojîk e ku nikare ber bi guhartinên demokratîk here, lewra her di wî şeklî de dimîne û di nav û derveyî welat de roj li pey rojê xirabtir dibe.

Derheq demokratîzekirina herêmê ji aliyê Amerîkayê ve, em li ser vê baweriyê ne ku Amerîka hewlê dide hin guhartinan di herêmê de pêk bîne. Dema ku yek du salan berî niha gelaleya Rojhilata Navîn a Mezin anî holê, me pêşbîniya vê çendê dikir ku ew nikarin gelaleya han bilez berbipêşve bibin. Lê min jêve ye gelaleya han hêj mîna xwe maye, renge bi awayekî lezgîn berbipêşve neçe, çunku pirsa demokratîzekirina Rojhilata Navîn ji bilî vê çendê ku bi qazancê xelkê vê herêmê û bi taybetî gelên bindest ên herêma han e, her wiha bi qazancê Amerîkayê ye ku herêma han navçeyek demokratîk be, lewra Amerîka ji bo vê armancê hewl û cehda xwe dide. Derbarê rûniştina me tevî Komara Îslamî a Îranê, tevî vê çendê ku em weke partiyek siyasî aştîxwaz in û me bawerî bi vê çendê heye ku arîşe û pirsgirêk tenê ji rêya danûstandin, gotûbêj û bi awayeke aştîxwazane çareser dibin, lê mixabin em Komara Îslamî a Îranê di vê çarçoveya fikrî de nabînin ku bi çareserkirina pirsgirêkan amadeyî gotûbêjan be. Heke Komara Îslam di hin qonaxan de amadeyî diyalog û gotûbêjan e, armanca wê ne çareserkirina pirsgirêkan e, belku dixwaze pirsan ji bo qazanc, vêc û siyaseta xwe berbipêşve bibe. Mînaka herî baş bona vê çendê doza Etomî a wî welatî ye ku çendîn sal e didome. Derheq vê pirsê, welatên 5+1 berdewam danûstandinan tevî wî welatî dikin, lê her weke ku em mêze dikin di heyama wan çend salên bihurî de, serbarê vê çendê ku sê biryarnameyên cezakirinê ji aliyê Konseya Ewlekarî a Neteweyên Hevgirtî li dijî wî welatî hatine pesendkirin, hêj ew rejîme li ser siyasetên xwe biîsrar e. Lewra ez li ser vê baweriyê me ku rûniştin û diyalog tevî Komara Îslamî bêfêde ye û tu destkevtek nabe, her çend ku me weke PDK Îranê di qonxekê de eva ceribandiye û di pêxema siyaseta xwe a aştîxwazane de nirxek zaf daye û weke ku hûn jî dizanin Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sekreterê Giştî yê partiya me di vê pêxemê de şehîd bû. Em niha gihîştine vê qîmê(qenaet) ku Komara Îslamî bi tu awayekê tevî danûstandin û diyalogê nîn e û naxwaze ku arîşeyên xwe ji vê rêyê ve çareser bike. Em ne hêvîdar in jî ku rojek ji rojan bona çareserkirina pirsgirêkan tevî Komara Îslamî danûstandinan bikin.

**Piştî hin cudabûn û veqetiyanên ku di nava partiyên Rojhilatê Kurdistanê de hatin holê, nêrîn û dîtinek li ser partiyên han çêbûye ku bi awayekê yê bûye sedema bêhêvîtiyê. Bêhêvîbûn bi wateyekê ku gellek zehmet e ji bo berbirûbûn tevî Komara Îslamî partiyên han bixwazin hevalbeniyekê bihev re pêk bînin. Hûn çawa pirsa han dinirxînin?**

Cudabûna hin deste û girûpan ji partiyên Rojhilatê Kurdistanê û pêkanîna partiyên nû, pirsek nû nîne û her taybetê Rojhilatê Kurdistanê jî nîn e. Di her civakekê de ku diyalog, gengeşe û nîqaş hebe, pirsa han rû dide û em rojane di cîhanê de jî şahîdê vê çendê ne. Diyar e partî li ser rêkevtinê ava dibin, wate desteyek ji mirovan li dor hin bername û bîr û rayên hevbeş kom dibin, dema ku cudahî di bîr û rayên wan de pêk tê, jihevcudabûn jî tiştekî normal e, min jêve ye cudabûn demekê cihê bêhêvîtiyê ye ku ew desteya ku cuda dibin, dest ji xebatê berdin, hekene avakirina partî û saziyên din û xebat bona jiholêrakirina dîktatorî û gihîştin bi azadiyê, nabe sedema bêhêvîbûnê. Gelê Kurd ne li Rojhilatê Kurdistanê û ne jî li parçeyên din yên Kurdistanê nabe bi vê çendê bêhêvî bin, ji aliyekî din jî eva rast e ku cudabûnên niha, heya qasekê asteng û girêpêçk li hember hevgirtin û xebata partiyên Rojhilatê Kurdistanê çêkirine, lê eva bi vê wateyê nîn e ku arîşeyên han hetanî dawiyê weke xwe dê bimînin. Ez li ser vê baweriyê me, zirûfa me a niha, ji zirûfa me ya destpêka hatine ser kar a Komara Îslamî xirabtir nîn e. Me wê demê bi hevkarî û hevdengiya pirraniya partî û aliyên siyasî ku wê demê di Îranê de hebûn û gellek belavwelatir ji niha bûn, karî desteya nûneratî a gelê Kurd pêk bînin û tevî Komara Îslamî bikevin danûstandin û diyalogê. Wê demê bi bîr û rayên cuda, ji Komonîstên tundrew ve heya Îslamî û Demokratan, me karî di bin çetra desteya nûneratî a gelê Kurd de kom bin û nêrîna xwe ji Komara Îslamî re bidin zanîn. Mixabin her çend ku danûstandinên han tu encamek jê neket, lê mînakek bû bona vê çendê ku partiyên Kurdî dikarin bihev re bicivin û xebata hevbeş bimeşînin. Ji bilî vê çendê jî, me sê salan berî niha hewl da ku tevî neteweyên din yên Îranê weke Ereb, Belûç, Turk û Turkmen ku ew jî weke me di bin zilm û zoriyê de ne, hevdengiyekê pêk bînin ku bixweşî ve em di vê xebata xwe de serkevtî bûn. Di destpêkê de me bi hevkariya heft saziyan karî Kongireya Neteweyên Îrana Federal ava bikin ku heya niha partiyên beşdar di vê kongireyê de yê gihîştine 15 partiyan ku di nava wan de aliyê kêm sê partiyên Kurdî bihev re hevkar û hevarmanc in, çima em nikarin tevî partî û saziyên din ên Kurdî bona xebata hevbeş rêk bikevin? Ger wiha bû eva ne cihê bêhêvîbûnê ye, belku em gellek bi vê çendê hêvîdar in. Em bixwe hewlê didin ku bikarin piştî cudabûnên han, zirûfê aram bikin û etmosferek siyasî a normal bînin holê, em dixwazin gavan bavêjin û hevgirtinekê bînin rojevê. Min jêve ye di dema xwe de, dê zirûfek baş ji bo vê çendê were holê, niha em hemû di armancên xwe de hevbeş in, armanca me hemûyan hiloşandina Komara Îslamî û avakirina sîstemek demokrat û federal e ku bikare mafê neteweyên Îranê garantî bike. Li gor nasiyariyekê ku min ji partiyên opozîsyon ên Rojhilatê Kurdistanê heye, dijberiyek wiha a siyasî mêze nakim ku nehêle em bihev re xebatê bikin, ji bilî hin partiyên komonîst ku gellek kin in û nahên berçav, saziyên din ên Kurdî di çarçoveyek siyasî û fikrî a wekhev de ne, lewra hevgirtin ne tenê nemimkûn e, belku gellek jî mimkûn e.

www.arsivakurd.org

# Mayîn Dijminên Nivistî Ên Mirovan

**Azad Kurdî**
**azadkurdi@hotmail.com**

Roja 4'ê Nîsana 2008'an, sêyemîn salvegera diyarîkirina Roja Cîhanî a Hişyarkirin derheq Mayînan û Piştgirî ji kar û Çalakiyên Mayînên Dijî Kes e, di sala 2006'an de, Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ev gava mirovî û berpirsiyarane bi armanca nehêlan û ji holê rakirina mayînên çandî di cîhanê de avêt. Ev roje bi pêşniyara welatên endam di Peymannameya Navneteweyî ya Qedexekirina Mayînên Dijî Kes, naskirî bi **Peymanameya Otawa** hate rojevê ku niha hejmara welatên endam ên wê paymannameya cîhanî gihîştiye 158 welatan.

Mekanîzma herî baş ji bo çareseriya vê pirsgirêka mezin a cîhanî, meşandina bername û armancên Peymannameya Otawayê ye, nemaze di wan welatan de ku qasê herî zêde mayîn û teqemeniya paşmayî a şeran tê de heye. Ji ber ku ev peymanname berhemanîn, çêkirin, veguhastin û bikaranîna mayînên dijî kes qedexe kiriye û bona jinavbirin û hilgirtina mayînên binerd ên paşdemayiyên şeran bi awayên cur bi cur piştgirî û alîkariya wan welatan dike ku mayîn tê de zaf in.

Bi henceta vê roja cîhanî, Neteweyên Yekbûyî raporek weşand û bal kişande ser vê yekê ku di sala 2007'an de, 6 hezar kes bi sedema teqîna mayînan bûne gorî. RNY di rapora xwe a îsal de balê dikişîne ser vê yekê jî ku serbarê vê çendê ku bizaveke mezin a alîgirên mafê mirovan û navend û rêxistinên aştîxwaz û mirovhez û herwiha saziyên nedewletî ji bo vê pirsgirêka navneteweyî di seranserê cîhanê de daye destpêkirin, lê hêj mayînên dijî kes û bikaranîna wan arîşe û pirsgirêkeke navneteweyî ye û destnîşan dike ku mayînên sererd û binerd di salê de dibin sedema kuştin û siqetbûna zêdetirî 20 hezar kesan û aliyê kêm yek ji pênce a van goriyane zarok û jin in ku piraniya wan xelkê sivîl pêk tînin.

Di seranserê cîhanê de hebûna mayînên neteqiyayî ê bûye kirîz û qeyranek navneteweyî. Hebûna mayînan li zêdetirî 80 welatên cîhanê yê bûye sedema vê çendê ku bi milyonan, jin, zarok, kur û keç li tirsê jidestdana jiyana xwe an beşek ji laşê xwe, tûşî tirs û nigeraniyeke xurt û berdewam dibin û bi vê sedemê ve kar û jiyana wan bikeve xeter û tehlîkeyê û heta ziyan û xisarên zaf ji bo beşên cotkarî, tendurustî, perwerde, bazirganî, sermayedanîna navxwe û derve û wd... a welatan dide.

Di nava welatên cîhanê de, Mîsr bi hebûna zêdertirî 23 milyon mayînan li pileya yekem û Îran bi 16 milyon mayînên neteqiyayî li pileya duyem û welatên Efxanistan, Îraq, Angola û Çînê bi 10 milyon mayînan di pileya sêyem a cîhanê de cih girtine. Rapor vê yekê didin xuyakirin ku nêzîk 110 milyon mayîn li zêdetirî 80 welatên cîhanê de hatine çandin an bikaranîn ku salane dehan hezar mirov dibin goriyên wan.

Her wekî me li ser qala vê çendê kir, Îran bi 16 milyon mayînan, duyemîn welatê cîhanê ye ku herî zêde mayînên çandî tê de hene û çendîn sal e ku ev qasa mayînan wekî xwe mane, kêm nekirine.

Hebûna vê hejmara mayînan di Îranê de vê rastiyê diselimîne ku desthilatdarên Komara Îslamî tu gaveke hewce û micid bona hilgirtin û paqijkirina mayînan neavêtine. Yanî para Îranê 16 ji sedê a hejmara mayînan di cîhanê de ye, teqîna her mayînekê dibe sedema kuştin û jidestdana laşê mirovekê yan çend kesan ku eva bi xwe tirajîdiyek e. 4 parêzgehên Kurd ên Kurdistana Rojhilat (Azerbaycana Rojava, Kurdistan, Kirmaşan û Îlam) tevî parêzgeha Xozistanê -piraniya akinciyên vê Ereb in- hejmara herî zêde a mayînên çandî ên dijî kes û madeyên neteqiyayî ên Îranê li xwe girtine. Bi awayekê ku çar milyon hektar ji zeviyên van 5 parêzgehane û herêmên din ên tixûbê Rojavayê Îranê bi mayînên çandî hatine pîskirin. 70 ji sedê a 16 milyon mayînên li Îranê li 4 Parêzgehên Kurdistan û Xozistanê ne. Mixabin serhejmariyeke rast li ser qasê kuştin û nivîşkanbûna goriyên mayînan di Îranê de tune ye, lê rêxistinên parêzerên mafê mirovan û saziyên nedewletî basa vê yekê dikin ku di wan 5 parêzgehan de ku çar ji wan Kurdistanî ne, rojane 2 heta 3 kes tên kuştin. Pirraniya van mayînane di encama 8 sal şerê malwêranker yê navbera Îran û Îraqê(1980-1988) de hatine çandin, lê tişta ecêb û balkêş eva ye ku îsal 17 sal ji wî şerî derbaz dibe, lê hêj em rojane şahidê mirin û birîndarbûna çend mirovan ji rêya teqînag mayînan di Îranê de ne.

Li gor serhejmariyan, ji sedê 78 a bûyerên teqîna mayînan dibin sedema kuştin, nivîşkanbûna mirovên gorî û nêzîk bi 38 ji sedê a goriyên mayînan bi sedema nebûna îmkanatên pijîşkî û tendurustiyê yên beriya çûn ji bo nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest didin.

Wezareta Parastina Komara Îslamî a Îranê ku erkê paqijkirina zevî û erdê mayînrêjkirî ên Îranê li stû ye, hemû salekê qewl û soza nehêlan û ji holê rakirina mayînan di van 5 parêzgahên Îranê de dide, lê em dibînin ku piştî bihurîna 17 salan ji dawîhatin bi şerê Îran û Îraqê re, hêj mayînên çandî ên nava zevî, zozan, çiya û wd... ên Kurdistana Îranê bi cih mane û ji bilî têkdan û tevlihevkirina jîngeha Kurdistanê ê bûye sedema



bêewlehî û pêşneketina Kurdistanê di warê aborî de û berdewam zirar û xisarên mezin ên malî (dirav) û canî çê dibin û roj nine ku em nûçeyê mirin û kêmendambûna kasibkar, têledar, jin, zarok, ciwan, cotkar û zehmetkêşên Kurdistanê nebihîsin.

Gumanek ku kiryar û çalakiyên kêm û bertesk ên organ û dezgehên vê rejîmê li dor paqijnekirina mayînan ji mirov re derdixe holê eva ye ku gelo tu bêjî, rayedarên Komara Îslamî ji ber ku pirraniya cih û deverên mayînrêjkirî ên Rojavayê Îranê ku neteweyên Kurd, Ereb û Azerî lê dijîn, bi taybet 4 Parêzgeh ji wan pênc Parêzgehên ku mayînên çandî têde hene, kurdakincî ne, di çarçoveya polîtîka serkut û çewisandina li dijî neteweyên Îranê pêk neînin û ev arîşe û xetera mezin bêçareserî hêlaye û tu gaveke hewce û bibandor jê re naavêje?! Di halekê de, heke ev pirsgirêka çendîn salî a ku berengar û berbirûyê xelkê van 5 parêzgehane bûye û rojane canê çend hemwelatiyên sivîl û bêguneh distîne, ger li hinek cih û navçeyên din ên Îranê biban, di demeke kurt û kin de dê bihata çareserkirin û mayîn dê bi tevahî bihatana paqijkirin... .

www.arsivakurdi.org

# Komkujiya Gêçê

Azad Kurdî û Elî Munezemî

Dîroka netewa Kurd rastî zilm, zordarî, malwêranî, qirkirin û wd hatiye. Ev kiryar pirranî ji aliyê hakimên dagirker û dijminên gelê Kurd û dûr ji hemû pirensîpeke exalî û mirovahiyê li dijî gelê me hatine meşandin. Di dîroka 29 sal desthilatdariya rejîma Komara Îslamî a Îranê de, em şahidê dehan cinayet û komkujiyan li dijî gelê Kurd di vî parçeyê Kurdistanê de bûne. Wekî Qarnê, Qelatan, Xelîfan û dehan nimûneyên din... Di vê nivîsarê de, em dê lênihêrînê li ser aliyên cuda cuda yên komkujiya gundê **Gêçê** bikin ku bi kêmî di medyayên Kurdî de hatiye baskirin.

26 salan berî niha û di destpêka Bihara sala 1361'an a Rojî (Adara 1982)an de, anku roja 2'ê Xakelêweya wê salê, cinayetek hov û nemirovane a din li dijî gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê desthilatdarên taze bidesthilatgihîştî ên Komara Îslamî a Îranê ve hate meşandin. Gundê Gêçê li devera Soma Biradost a bajarê Urmiyê di wê rojê de bû armanca êrîşa hêzên kurdkuj ên rejîma Xomeynî.

Xelkê Gêçê cotkar û pezdar in û navçeyek bi tavahî çiyayîn e û xweza û hewayeke pirr xweş û dilhebîn heye. Ji aliyê Rojhilat ve bi Çiyayê Şêx Bazîdê Bestamî, ji aliyê Rojava bi gundên Gunbed û Cilqiran, ji aliyê Bakur bi gundê Bawan re û Başûr jî tevî gundê Heleqoşê re cîran e. Ji qedîm zeman ve, xelkê vî gundî bi welatparêzî û azadîxwazî û wekhevxwaziyê bi nav û deng bûne. Bi taybet piştî ku Komara Îslamî desthilat bi destve girt, gellek fidakarî û gorî dane. Çendîn şehîd pêşkêşî tevgera azadîxwaziya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi serkêşiya PDK Îranê kirine. Çendîn caran gundên wê herêmê û nemaze gundê Gêçê ji aliyê hêzên Komara Îslamî rastî êrîşên esmanî û bejahî hatiye û dehan kesên sivîl û bêguneh bi taybet jin û zarok şehîd û birîndar bûne. Herwiha gellek xisar û ziyan heta niha gihîştine gundiyên xizan, destkurt û kêmdahat ku bi ked û zehmetek zaf debara jiyana xwe dikirin/dikin.

Gêçê herdem melbendeke Pêşmergehezker û demokratperwer bûye, ji ber vê yekê berdewam ketiye ber ker û kîna rayedarên azadîkuj ên Hikûmeta Îslamî a Xomeynî. Piştî şerê giran yê Pira Cohniyê di 02.01.1362(1983)'an de ku gundê Gêçê şahidê êrîşa herî xurt û hovane a topbaran û katyûşabarana Pasdarên Komara Îslamî bo ser hemwelatiyên sivîl ên vî gundê bakurê Kurdistana Îranê bû.

Seet nêzîk 4 heta 5:30'ê serê sibê a roja 02.01.1982'an bû – seetek beriya ku roj bihelêt û stêrk di esman de nemînin – ku hêzên Sipaha Pasdaran bi alîkariya hinek kirêgirtiyên xwe ji aliyê Rojhilat (Çiyayê Şêx Bazîd) û dundên Şikeftik û Sofî Kanûn ketin nava gund û di destpêkê de mala **Şehîd Ehmed Muceredî** ku weke nexweşxane ji bo dermankirina Pêşmerge û şervanên Kurdistanê mifah jê dihat wergirtin, hate dagirkirin û piştre Idrîs Muceredî ku li ser sicac jimêja sibê dikir tevî xortê wî bi navên Cergez (1341), Idrîs û Pêşmergeyek bi navê Hişmet Xîzî wekî rehîn girtin. Di wan deman de bû ku Şehîd Siltan Seîdî - Pêşmerge bû - kurê Ehmed, jidayîkbûyiyê sala 1313'an bi êrîşa Pasdarên rejîmê bo ser gund dihese û bi dengeke bilind gazî ji gundiyan dike: "Ey gundîno rabin, îro roja mêratiyê ye..". Bi deng û hawara wî şer û pevçûn dest pê dike. Di encama şer de, 13 kes ji xelkê gundê Gêçê hatin kuştin û ji bo xwestekên neteweyî û berevanî ji şeref û heysiyeta xwe bûne gorî û jiyana xwe ji dest dan. Xincî Pêşmergan ku di vê bûyerê de şer kirin, gundî bêy ku şer bikin, hemû di malên xwe hatin derêxistin û piştre jî hatin gulebarankirin.

Lê xala balkêş û ecêb, awayê Şehîdkirina gundiyan bi destê Pasdarên Komara Îslamî a Îranê bû, piştî ku çend kes ji gundiyên sivîl û bêguneh bi rehîn tên girtin, bê tu pirs û bersivek û heta dadgeh û mehkemeyek tên gulebarankirin ku eva ji hemû exlaq û pirensîpeke mirovî bi dûr bû û ev cinayeta Pasdaran weke yek ji komkujiyên li dijî gelê Kurd tê hesibandin ku di karnameya xwe ya tejî cinayet û mirovkujiya bê xal û xerez a welatiyên sivîl tomar kirin. Pirraniya Caş û kirêgirtiyên ku di wê komkujiyê de alîkariya Pasdarên dagirker kirin, kirêgirtiyên Gagarî, Mistefa kurê Emê û Gorsêl bûn.

Kesên ku di wê komkujiyê de jiyana xwe ji dest dan bi vî awayî bûn:

1. **Ehmed Muceredî**, kurê Mihemed, jidayîkbûn: 1284, sivîl û cotkar, zewicî û xwediyê 8 zarokan, awayê Şehîdkirinê: Îdam bi rêya gulebarankirinê.
2. **Riza Xelîlî**, kurê Îbrahîm, sivîl û cotkar, zewicî û xwediyê 8 zarokan, awayê Şehîdkirinê: Îdam bi rêya gulebarankirinê.
3. **Ebdulrehîm Mistefayî**, kurê Rostem, jidayîkbûn: 1333, sivîl û cotkar, zewicî û xwediyê 3 zarokan, awayê Şehîdkirinê: Îdam bi rêya gulebarankirinê.
4. **Kemal Mistefazade**, kurê Esed, jidayîkbûn: 1337, Xwendekar, nezewicî bû, awayê Şehîdkirinê: Îdam bi rêya gulebarankirinê.
5. **Cergez Muceredî**, kurê Ehmed, jidayîkbûn: 1341, Xwendekar, nezewicî bû, awayê Şehîdkirinê: Îdam bi rêya gulebarankirinê.
6. **Cehangîr Mihemedî**, kurê Ebdula, sivîl û cotkar, zewicî û xwediyê 12 zarokan, awayê Şehîdkirinê: Îdam bi rêya gulebarankirinê.
7. **Esed Mistefazade**, kurê Îsa, sivîl û cotkar, zewicî û xwediyê 11 zarokan,



Dîmenek ji gundê Gêçê

www.arsivakurd.org

awayê Şehîdkirinê: Îdam bi rêya gulebarankirinê.

8. **Heqî Seîdî**, kurê Elîriza, jidayîkbûn: 1336, Pêşmerge, zewicî û xwediyê 3 zarokan, awayê Şehîdkirinê: şer û pevçûn.

9. **Mehmûd Husênzade**, kurê Riza, jidayîkbûn: 1336, sivîl û cotkar, zewicî û xwediyê 3 zarokan, awayê Şehîdkirinê: Îdam bi rêya gulebarankirinê.

10. **Siltan Seîdî**, kurê Ehmed, jidayîkbûn: 1313, Pêşmerge, zewicî û xwediyê 10 zarokan, awayê Şehîdkirinê: şer û pevçûn.

11. **Idrîs Muceredî**, kurê Ehmed, jidayîkbûn: 1325, Pêşmerge, zewicî û xwediyê 6 zarokan, awayê Şehîdkirinê: Di şer de êxsîr hate girtin û piştre îdam kirin.

12. **Îbrahîm Ehmedî**, kurê Casim, jidayîkbûn: 1333, sivîl û cotkar, zewicî û xwediyê 3 zarokan, awayê Şehîdkirinê: şer û pevçûn.

13. **Mihemed Dîrînî**, kurê Omer, jidayîkbûn: 1309, Pêşmerge û xelkê gundê Golegeniyê, zewicî û xwediyê 11 zarokan, awayê Şehîdkirinê: şer û pevçûn.

Ji bilî Şehîdên ku li jor navê wan hate baskirin, hêzên rejîmê 35 kesên din digirin û rapêçî girtîgeha Navnendî a bajarê Urmiyê dikin û bi xurtî tên îşkencekirin, ji ber îşkenceyên hovane welatiyek bi navê



Dimenek ji gora şehîdên Gêçê

Şekûr Ehmedî birayê Şehîd Îbrahîm Ehmedî di bin îşkenceyan de aqilê xwe ji dest da, dîn dibe û heta dawiya jiyanê di dînatiyê de jiya. Di nava 13 Şehîdên komkujiya gundê Gêçê de, Şehîdanên nemir: **Siltan Seîdî, Mihemed Dîrînî, Idrîs Muceredî** û **Heqî Seîdî** endam û Pêşmergên PDK Îranê bûn ku tenê tawan û sûça wan, azadîxwazî û daxwaza maf û hiqûqên mirovî û demokratîk ên neteweya Kurd li Kurdistana Rojhilat bûn. Şehîdê herî dawî yên vî gundî jî, **Cimşîd Kamran**, Pêşmergeyekî çeleng û jêhatî yê PDK Îranê bû ku piştî dîlgirtinê, sala 1989'an li girtîgeha bajarê Urmiyê hate îdam û Şehîdkirin.

Piştî vê bûyerê jî gundê Gêçê gellek caran kate ber êrîşa helîkopter û topbarana Pasdarên kurdkuj ên Komara Xomeynî û ziyan û xisarên zaf digihîjandin xelkê vî gundî.

Di 26'mîn salvegera komkujiya xelkê gundê Gêçê de em dibêjin: Nav û bîranîna van Şehîd û goriyên serbilind dê herdem di dîroka tejî rûmet û şanazî a xebata azadîxwaziya Kurdistanê de zindî û bilind bimîne û ji aliyekî din, bûyera han weke xaleke reş û tarî û hovane di karnameya tejî cinayet û kurdkujiî a Komara Îslamî a Îranê de bimîne û dê rojek were ku rêveber û encamderên vê komkujiyê li hember mehkemeha heq, edalet û azadiyê bersivder bibin... .

## Şiroveya Peyvên Siyasî

Berhevkar: Omîd Esxeran

omid_anbi@yahoo.com



# Olîgareşî "Oligarchy"

Têgiha Olîgareşiyê ji peyva Yûnanî a Olîgariyayê hatiye wergirtin û tê wateya desthilatdariya taqimek biçûk ji texa dewlemend û desthilatdar ên nava civakê. Peyva han di pirraniya zimanên Ewropayî de tê bikaranîn û ji desthilatdariya siyasî û aborî a girûpek biçûk ji dewlemend, qiral, kedxwar û desthilatdaran pêkhatî ye û weke şeklek ji desthilatdariya kedxwaran tê hesibandin.

Sîstema han di qonaxên cur bi cur ên aborî û civakî(koyledarî, feodalî û sermayedariyê) de hebûye ku tê de komek biçûk lê zordar û xwedî desthilat, serwerî bidest ve digirtin û desthilahata xwe bi ser gelên bindestê xwe de, dimeşandin.

Di warên aborî, siyasî û civakî de hin caran peyva Olîgareşiya Darayî tê mêzekirin. Olîgareşiya Darayî tê wateya serweriya aborî û siyasî a girûpek kin ji sermayedarên mezin û xwedî heyîn ku bi kiryar xwediyên monopolên pîşesazî û bankî ne û dest bi ser gişt beşên sereke ên aborî de girtine. Bi vî awayî Olîgareşiya Darayî a qonaxa Împeryalîzmê weke qonaxa herî bilind û geşekirî a sermayedariyê tê hesibandin. Olîgareşiya darayî bi maneya zalbûna aborî û siyasî a hejmarek ji sermayedarên mezin e ku li serdemê Împeryalîzmê de serî hildan, dema ku hejmarek biçûk ji monopolên mezin bi ser gişt navendên giring ên aborî û heyînê de, zal dibin. Di encama vê çendê de, tevlîhevbûna sermaya pîşesazî û heyîna bankên monopolkirî(sermayeya darayî) tê holê.

Bo mînak li Dewletên Hevgirtî ên Amerîkayê, hejmarek gellek kêm ji monopolên bihêz ên darayî weke Morgan, Dopen û Rokfler desthilatdariyê bi ser aborî û siyaseta wî welatî de dikin. Di wî welatî de, eger çi evana ji 9 girûpan zêdetir nîn in, lê bi 60 malbatên mezin tên nasîn ku desthilata tim beşên sereke ên aborî, siyaseta navxweyî û derve, dezgehên ragihandinê, zanîngeh, sazî û navendên dewletî, teknîkî û wd... di destê wan de ye.

Li welatê Fransayê, Olîgareşiya han bi 200 malbatan hatiye nasîn ku sermayeyên monopolkirî, bank û pîşesaziya welat bidestve girtine.

Olîgareşiya darayî ji bo misoger û ewlekirina serweriya xwe, ji alav û şêwazên cur bi cur mifahê distîne û bi sedan dezgeh û tayên mezin û kompaniya bi navên cur bi cur ava dike û bi hevbeşî tevî dezgenên din û kirîna beşan, çavdêriyê bi ser wan de dike û bandor û desthilata xwe bi ser aboriya welatên din de, berfirehtir dike.

Olîgareşiya darayî, ne tenê ji rêya han ve qazancek zaf bidest tîne, belku ji pîşesaziya leşkerî jî qazancek zaf bidestve tîne. Her wiha dezgehên dewletî, ragihandin û hînkirinê dixe bin desthilata xwe û bi ser siyaseta navxwe û derve a welat de zal dibe û pilanan ji bo wan dadirêje.

Di rastî de ji ber serdestiya Olîgareşiya Darayî, azadiyên demokratîk ên burjûwayî jî tên tepeserkirin û modelek ji senteralîzma desthilahat dewletî di destê qata han de dicive ku bi Pilotokrasî "Plutocratie" tê nasîn. Lewra em dikarin wê weke dîktatoriya Olîgareşî a darayî bihesibînin ku bi ser gişt warên aborî, siyasî û civakî de zal e.

**Çavkanî:**
**Ferhengî Ramiyarî Nîga "Azad Weledbegî"**
**Danêşnamêyê Siyasî (Politicial Dictionary)**
**"Daryûş Aşorî"**

www.arsivakurd.org

# Sedemên Jordeçûna Temenê Zewacê

**Wergeran ji Farsî: Hozan**

Jiyana hevbeş di civakê de weke yek ji pirsên girîng û çarenivîssaz di jiyana mirovan de tê hesibandin û di warên cur bi cur de ketiye/dikeve ber lêkolîn û dahûrandinê. Yek ji van waran, temenê zewacê ye ku dikare encamên nifûsî, civakî û pîskolojîkî tevî xwe hebe. Zewac di temenê jor de, hem encamên erênî hene û hem nerênî.

Bo mînak jiyana hevbeş di temenê jor de dibe sedem ku ciwan tûşî zext û givaşên pîskolojîkî, xemgînî, tirs û... bibin û navbeynê dixe navbera emrê dayîk, bav û zarokan.

Ji aliyekî din ve jordeçûna temenê zewacê dibe sedema zêdebûna sermayeyên civakî û ciwan dikarin bi dîtineke vekirîtir hevjîna/ê xwe hilbijêrin. Mirov dikare bibêje ku ev yeka di jiyana mirovan de xwedî bandoreke erênî ye.

Lê pirr caran jordeçûna temenê zewacê dibe sebebê bêhêvîbûnê û li ser pîskolojiya mirovan bandora xirab heye. Heta şiyanên takekesî jî nikare pirsgirêkê han çareser bike.

Her civakek derheq metod û şekla têliliyên cinsî(zayendî), xwedî yasayek e, yek ji wan qanûnan temenê zewacê ye. Her civakek temeneke taybat bona pêkanîna jiyana hevbeş ji bo jin û mêran bi baş dizanin. Di Îranê de jî temenê qanûnî yê zewacê ji bo keçan 13 sal û ji xortan re 15 sal e. Lê li gor serhejmariyên ku hatine encamdan, temenê pêkanîna jiyana hevbeş ji bo jin û mêran di Îranê de di navbera 12-35 saliyê ji bo jinan û 15-40 saliyê ji bo mêran e.

Temenê zewacê, temenek e ku takekes di wî temenî de pê davêje nava jiyana hevbeş. Li gor lêkolînên ku hatine encamdan, sedemên diyarîkirina jiyana hevbeş li berê û niha guheriye. Lê berê temenê jinan di yekemîn zewacê de girêdayî bû bi evraz û nişîvên aborî di jiyanê de.

Serhejmariyên heyî nîşan didin ku navinca temenê zewaca mêran li Îranê tevî guhartineke berfireh berbirû nebûye û hêj li derdora temenê 25 saliyê di rewşeke serjêr û serjor de ye. Lê temenê zewaca jinan di navbera salên 1996-2002'an de, jorde çûye û jordeçûna han di du dehsalên borî de xurtbûneke zêdetir hebûye. Bi terzekê ku di sala 2002'an de pitir ji yek ji çar ya keçên 25-29 salî, hêj nezewicî bûn.

Pirsên aborî yek ji sedemên jordeçûna temenê zewacê ye. Bêkarî û berfirehbûna pirsgirêka han di asta civakê de, tevî jordeçûna çavnihêriyên aborî yên malbatan, beşeke zaf ji hêz û şiyana ciwanan kêm dike. Kêmbûna hêz û şiyana han yekemîn mînak e derheq jordeçûna



temenê zewacê.

Hejmareke zaf ji keç û kur li ser vê bingehê hevjîna/ê xwe hildibijêrin.

Li gor serhejmariyên fermî û ne fermî, asta bêkariyê di welatê me de bi qasekê ye ku ji navinca cîhanî gellek jordetir e û yek ji kirîzên civakê tê hesibandin.

Her çiqas pirsgirêka bêkariyê hemû çîn û qatên civakê bi xwe ve digire, lê bêkarî di nava xwendekarên asta karnasî û karnasiya bilind de weke yek ji pirsgirêkên bixeter a civaka me tê zanîn.

Bêkariya mêran û kêmbûna asta heqdestê wan, yek ji pirsgirêkan tê hesibandin ku dibe sebeb xortên ciwan hevjîna xwe bona zewacê û pêkanîna malbatê hilbijêrin.

Ciwanên îro rojê bi sedema pêşkevtina teknolojiyayê û nûjenbûna civakê, di hilbijartina hevjîna/ê xwe de hinek form û pîvanên cîhana nûjen li ber çav digirin. Îro rojê ji bo jinan pîvanên weke rola civakî, asta xwendinê, wekheviya jin û mêran, karkirin li derveyî mal û ... girîng in. Xwendin di asteke bilind de dikare di jordeçûna temenê zewacê de bandor hebe. Bi gotineke din destkevtên xwendinê dibe sedema beşdarî di hêza kar de û di encam de hezkirin bona pêkanîna jiyana hevbeş, kêm dibe.

Pirraniya keç û kur seba vê çendê ku nikarin hevjîna/ê dilê xwe hilbijêrin, hez nakin jiyana hevbeş pêk bînin. Serbarê vê yekê, çawaniya fikirîn û bîrkirina malbatan jî di vê derheqê de xwedî rol e. Ji ber ku malbat hez dikin zarokên wan di çarçoveya bîrkirina wan de tev bigerin.

Di encam de divêt em bibêjin ku temenê zewacê di her civakekê de di navbera jin û mêran de biferq e.

Sedemên xwedî bandor di temenê zewacê de navhatî ne ji temenê balixbûnê, hevjîneke/î baş, yasayên civakî, çanda civakê, rewşa aborî, kar û asta xwendinê.

www.arsivakurd.org

# Li Seranserî Cîhanê, Jin Tevî Ferq Û Cudahiyan Berbirû Ne

Li gor raporekê ku li ser daxwaza Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ve hatiye belavkirin, jin di pirraniya welatên cîhanê de, tevî newekhewiyê berbirû ne.




Di rapora han de hatiye destnîşankirin, eva di halekê de ye ku 185 welatên cîhanê heya sala 2005'an, soz dabûn yasayên ku ferq û cudahiyê dixin nava jin û mêran de, betal bikin.

Rapora han zêde dike ku %70 ji xizanên cîhanê jin in û jin tenê xwediyê %1 ji erdên belgedar di cîhanê de ne.

Ev rapore ku ji bo Luîz Arbor, Komîsara Mafê Mirovan a Saziya Neteweyên Yekbûyî hatibû amadekirin, dibêje ku hêj tecawuz di çarçoveya jiyana hevbeş di 53 welatên cîhanê de weke sûç nahê hesibandin.

Xatûna Forîde Banda ku rapora han amade kiriye, di konferanseke çapemeniyê de li Jenevê got: "Hin yasayên din ku li dijî jinan ferq û cudahiyan pêk tînin weke qanûnên pêwendîdar bi jihev veqetiyanê, îmtiyaz û hevkariyên piştî zarokbûna jinan û mafê xanenişîniyê ne.

Ev, rapora pêşniyarê dide ku mekanîzmek nû derheq xebat li dijî ferq û cudahiyan pêk were, çunku yasayên heyî yên mafê mirovan a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî û Konvansyonên navneteweyî li berçav nahê girtin.

## Bo Carek Din Mamsotayê Olî Eyûb Gencî Hate Girtin

Navenda Nûçeyan ya PDK Îranê da zanîn ku demjimêr 2'ê şeva înê, 11.04.2008'an, hêzên rejîmê êrîş kirin ser mala Mamostê Olî **Eyûb Gencî** û ew girtin.




Her wiha kesekî din bi navê Hesen Zarih, tevî mamosta Eyûb hate binçavkirin.

Eyûb Gencî, heyamekê berî niha ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatibû revandin û piştî îşkenceyekî zaf navhatî serbest hatibû berdan.

Mamosta Gencî, di axavtineke xwe a roja înê de, bi tundî gazinde ji siyasetên

## Dijwariyên Jiyanê Nahêlin Ku 13 Milyon Ciwan Bizewicin

Rêxistina Neteweyî a Ciwanan ku saziyeke dewletî di Îranê de ye, li ser rewşa zewaca ciwanan raporek weşand û da zanîn ku 13 milyon ciwan(keç û xort) di temenê pêkanîna jiyana hevbeş de ne, lê dijwarî û nebûna rewşa hewce a jiyanê ji bo ciwanan ê bûne sedem ku ciwan pirseke girîng bi navê zewacê paşde bixin.



Berpirsiyarekî vê rêxistinê, **Seyîd Mehdî Sedrî** eşkere kir ku ji vê hejmarê tenê nêzîk 2 milyon kes di sala borî de heta niha karîne jiyana hevbeş pêk bînin, lewra 8 sal hewce ye ku rewş ji bo 11 milyon ciwanên mayî pêk bîne. Lê ji ber ku nifûsa Îranê ciwan e, hejmara nifûsa ku diçe nav temenê ciwanî û zewacê de du qat zêdetirî şêniyekê ye ku di salê de dizewicin.

## Du Kes Li Bajarê Selmasê Hatin Kuştin Û Birîndarkirin

Roja 11.04.2008'an, hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê li herêma Xanesûz a nêzîk gundê Kozereş li derdora bajarê Selmasê(devera sersînor a di navbera Îran û Turkiyê de) kasibkaran didin ber êrîşa guleyan. Bi vê sedemê kasibkarekî temen 16 salî bi navê **Mîlad Pirnejad**, jiyana xwe ji dest da û kasibkarekî din bi navê **Şêrzad Muradpûr**, bi xurtî birîndar bû.

Kesên han akinciyên gundê Kozereşê ne.

## Li Îranê Hêzên Besîc, Sê Keçên Belûç Kuştin

Heyamekê berî niha sê keçûn Belûç li hember nexweşxaneya Elî Ibnê Ebîtalib a bajarê Zahidanê tên revandin û piştî mehekê, di çend rojên borî de, meytên wan di nava yek ji şeqamên bajarê Zahidanê de hatin peydakirin.

Ev sê keçane, ji eşîra Rîgî û keçên kesekî bi navê Husên bûn. Li gor lêkolînên ku hatine encamdan, kesên nenaskirî ku ev sê keç revandibûn, hêzên Besîc yên Zabolê bûne.

Tê gotin ku sê keçên Belûç bi awayekî hovane hatine îşkencekirin û piştre hatine kuştin.

## Keç Û Kur Li Pirtûkxaneya Giştî Û Navenda Çandî Ya Mehabadê Ji Hev Hatin Cudakirin

Wezareta Çand û Îrşada Îslamî di destpêka sala nû de, keç û xortên pirtûkxaneya giştî a Şêx Şelût û Navenda Çandî û Hunerî a Mehabadê ji hev cudakirin.

Li gor vê biryara nû, xort tenê dikarin rojên şemî, yekşem û duşem seredana navenda çandî û hunerî û rojên sêşem, çarşem û pêncşem jî seredana pirtûkxaneya giştî bikin û berevajî jî keç jî di wan rojên ku xort nikarin seredana wan du cihan bikin, dikarin seredana navenda çandî û hunerî û pirtûkxaneya giştî bikin.

# Qamişlo… Ber Bi Dîrokê Ve

**Mihemed Mehmûd Beşar**
**wergerandin1@hotmail.com**

Giringiya Qamişlo ji ku ve tê?

Di xebata gelên bindest de, bajarên mezin pirr girîng in û bi taybetî jî heger desthilatdar û karbidestên wî welatî, siyaseta cudakirina civakê ji siyasetê birêve bibin.

Li Rojavayê Kurdistanê (Kurdistana binxetê) bajarên mezin tune ne. Rast e gelê kurd li wî parçeyê Kurdistanê li ser xaka xwe ya dîrokî dijî, û paşmayên gelek bajar û Şaristaniyetên pirr Kevin û dîrokî li rojavayê welêt peyda dibin, lê bajarên mezin tune ne, yan jî tune bûn.

Desthilatdarên Ereb yên ku hebûna gel û neteweyên din ji bilî neteweya Ereb, berçav nagirin û siaseteka taybet li dijî gelê Kurd birêve dibin, bi mebesta lawazkirin, belengazkirin û hejarkirina wî. Û dixwazin – hêdî hêdî – ber bi jinavbirin û qirkirina ziman, çand, dîrok û taybetmendiyên neteweyî yên gelê Kurd ve biçin.

Partiya Beis ya ku ji sala 1963'an de û bi hêza tank û topan desthilatdariya Sûriyê xistiye destên xwe, sitemkariyê li her kesî dike (Kurd, Ereb, Ermen, Aşûrî, Çerkes …hwd).

Rast e Beis bi navê neteweya Ereb û di bin dirûşmên yekîtî û azadiya ereban kar dike û her bi vî navî jî bûye desthilatdar, lê di heman demê de jî mafê gelê Ereb jî zevt kiriye û hejmara herî mezin ji erebên Sûriyê bi agirê sitem û zordariya besiayn hatine şewitandin.

Lê sitema ku li ser gelê Kurd heye duqat e yan jî du alî ye. Zordariya ku li ser Kurdên binxetê heye di van waran de bi aşkerayî derdikeve û xuya dibe:

- Rewşa aborî :

Kurdên rojava ku yek ji pêkhateyên serekî yên Sûrî ne, ew jî wek bêtirê erebên Sûriyê ji ber xirabiya rewşa aborî dinalînin.

- Rewşa civakî :

Dûrxistin û cudakirina civakê ji siyasetê, bingeha siyaseta partiya Beis e.

Karbidestên Sûrî, hemû hêza xwe bikar tînin da ku bigihên vê mebestê, û bi rastî jî serkeftineka mezin bi dest anîne di warê dûrxistina civaka Ereb ji siyasetê ve. paşê jî, bi hemû hêza xwe ya serbazî, istixbaratî û aborî kefte nav civaka Ereb de û dest bi xerabiyeka pirr mezin kir.

Di encam de jî – niha – di nav civaka Ereb de bêdengî û tirseka mezin heye ji siyasetê ve, ji ber vê yekê jî partiyên ereb yên dijberê partiya beis ya disthilatdar pirr lawaz in û çi carî nikarin bibin rêber ji nerazîbûna ereban re.

Civaka bê siyaset pendeka bapîran di bîra me de tîne : (…wek pezê bê şivan e), civaka bê siyaset jî tev de wek pezê bê şivan e.

Lê hewldan û bizavên karbidestên Sûriyê di warê dûrxistina civaka Kurdî ji siyasetê ve bê encam bûn. Civaka Kurdî li rojava civakeka zindî bû û her zindî jî maye. Roj bi roj çalakvan, siyasetmedar û rewşenbîr cihê xwe bêtir di nav vê civakê de digirin û rola wan bihêztir dibe.

Hejmara xwendevanên kurd sal bi sal û bi awayekî balkêş bêtir dibe û hejmareka mezin ji wan xwendevanan berê xwe didin siyasetê û dest bi karê siyasî dikin.

Partiya Beis ji aliyê xwe de, her berdewam e di bizav û hewldanên xwe de. Bi mebesta xerabkirina civaka Kurdî, ji ber vê yekê jî gellek nexweşiyên civakî serê xwe hildidin. Lê di encam de civaka Kurd bi zindîbûna xwe, ji her kesî re da xuyakirin ku ew bi gelekî ji karbidestên Sûriyê bihêztir e, û şikartê wê jî - bi tenê – vîn û viyana wê û her wisa hezkirina gelê Kurd ji azadiyê re ye.

- Rewşa siyasî :

Wek ku li jorê hate gotin, siyaseteka taybet li dijî gelê Kurd li Sûrî ji aliyê beis ve tê birêvebirin. Ev siyaset ne bi tenê ji aliyê hikûmetê ve tê birêvebirin, lê belê partiya beis û di dema desthilatdariya xwe de ya ku ta niha jî berdewam e, karîbû di mejiyê ereban de çend bêbextiyên dûr ji rastiyê biçîne di derbarê hebûna Kurdan de.

Yek ji wan bêbextiyan hev e : "Kurd metirsiyeka pirr mezin in li ser yekîtiya xaka Sûrî".

"Kurd mêvan in, piştî şikestina şoreşa Şêx Seîdê Pîran, ji ber zordariya Tirko reviyane û berê xwe dane Sûrî û ji wê çaxê de li Sûrî niştecih bûne".

Di bin bandor û kargêriya van bêbextiyan de, desthilatdarên Sûriyê kîneka mezin di dilê ereban de li himber gelê Kurd de çandin û ji ber vê yekê jî gelê Ereb gellek caran piştevaniya siyaseta hikûmetê dike ya ku li himber gelê Kurd birêve dibe.

Ji aliyekî din ve, kuştina gencên Kurd bi destên dewletê yên qirêj berdewam e, û her wisa jî guhartina navê gund û bajaran ji kurdî bo erebî, girtin û binçavkirina çalakvanan, bênasnamekirina beşekî mezin ji gelê Kurd, dûrxistina xwendevanan ji xwendinê û avêtina wan ji peymangeh û zanîngehan jî hîn berdewam e.

Piştî vê şîrovekirinê, dîsan em li pirsa xwe vedgerin :

- çima Qamişlo ber bi dîrokê ve diçe ?

Kurdên Rojavayê Kurdistanê (Kurdistana Binxetê) bi bîr û baweriyeka mezin û bi zanebûn Qamişlo mezin kirin.

1.ji ber ku pêdiviya rojava bi paytextekê heye.
2. Kar û xebata siyasî û ya rewşenbîrî di bajarê mezin de xweştir û asantir e.

Îro çi li Rojavayê Kurdistanê çê dibe , ji Qamişlo dest pê dike.

Çi tevgerek hebe, li Qamişlo serê xwe hil dide.

Çi mûmeka bi ronahî hebe, li Qamişlo tê vêxistin.

Qamişlo ne bajarê Qamişlo bi tenê ye: Dêrik, Amûdê, Dirbêsiyê, Serê kaniyê, Hesekê, Tiltemir, Tirbesibiyê, Çilaxa… ev bajar û bajarok tev de Qmişloka evînê pêk tînin. Li kêleka wê jî Efrîn û Kobanê hene ku her dem ronahiya xwe ji Qamişloyê distînin. Û Qamişlo jî bi NEWROZa xwe ya 2008 an wateya rast ya şoreşa NEWROZê vedgerîne û ji dîrokê re dibêje: "deriyên xwe li ser piştê veke, vaye ez hatim".

Kaniya Helbestan

# Kî hebû?



**Bêrî Bihar**

Kesên ku hebûn, tev çûn,
Ne tenê bi laşên xwe ji me veqetiyan,
Siyên wan jî dane dû laşên wan,
Weke werîsan dûvedirêj bûn, reş bûn, zirav bûn,
Dev ji me berdan û çûn.
Wê hên bersivên gazinên me bidan a,
Hên me yê ew,
ji bo meremoziyên wana bibexşandana,
û hên destên me li valahiyan li wan digeriyan,
Rêçên germiyên pêjnên wan nema gazî me dikin,
Pêjnên me ji pêjnên wan sêwî man.
Nepeniyên xwe di nepeniyên me de veşartin,
Awazên xwe yên nebihîstî,
Rûpoşên xwe yî cûr be cûr,
binax kirin.
Wanên ku di bin de dikeniyan di cihê girî de,
Carînan jî digiriyan di cihê ken de.
Kesekî nizanî bu ka çi diramin û çi dixwazin.
Hezkirinên xwe digotin dema ku xwestxapandinên
Wan xwe ji hiş berdidan ser rûyên wan.
laşên wan di asaniyan de bûn bi rûpoşan.
Ewên ku hebûn,
Bi tiştên xwe yên hez an jî îman jê çûyî ve,
Qehr û gazincên xwe,
Çêr û pêçariyên xwe,
Giraniya nerîtên xwe,
Xwêdana xwe ya ku mitêl pe avdidan
di şevên qels de,
kirin bar,
dane pişta me
û
çûn…

Kî hebû?
Ewên ku hebûn,
Tev çûn,
Dilêşî û kovanên xwe,
Carcarinan hêsirên xwe,
Tevlî neheqiyên ku
Bi porên me ve hûnandî bûn.
Kirin gilokên xeman û
Bi deriyê me ve daleqandin,
Ew hestên firoke, ji çûkan re kirin bar,
Bûne xewn û xeyal,
Serê sibekê ji kefa destên me firiyan
û çûn.
Kesên ku hebûn,
Ew ji xwe weke tune bûn…

www.arsivakurdi.org

# Salih Heydo
# ( Enistîtuya Gerok )

**Elî Şemdîn- Silêmaniyê**
**11.4.2008**

Di 2006'an de, li bajarê Silêmaniyê, li Herêma Kurdistana Îraqê, çapa yekê ya berga yekem û duyem ji pirtûka "**Dûrikên Kurdî**" ji aliyê Enistîtuya Kelepora Kurdî ve bi rengekî ciwan û xweşik hatiye çapkirin, ku du berhemên giring û pirbiha ne di warê folklora kurdî de. Di naveroka her du bergan de helbestvan û folklornasê kurd yê binav û deng Salihê Heydo 348 stiranên kurdî ji nav civata Kurdên Sûriyê berhev kirine, ji yên: horizî, destarhêrî, bêrîvanî, bêlûte, giranî, dolabrêsî, paleyî, qirşvanî, dankut, berdestarî, govendî, berbûkî û wd... .

Di van her du bergan de, hunermenda Japonî Komîka Okûmûrra ew sitran noteyên wan yê muzîkî bi rengekî akademîk nivîsîne li gor awazên folklorî yên ku folklornas Salihê Heydo bi dengê xwe jêre guhastine ji çavkaniyên resen yên millet.

Bi rastî ev kar bi xwe karekî gellek girîng û binirx e, ku Enistîtûya Kelepora Kurdî pê radibe, bi alîkariya van kesên pispor mîna Salihê Heydo û akademîk mîna hunermend Komîka Okûmûrra ku bi vî rengî kelepûra kurdî êdî zindî dibe ji windabûnê û tê parastin, Komîka Xan di pêşgotina van her du bergan de dibêje: "Ez hêvîdar im ku min xizmetek piçûk ji muzîka kurdî re kiribe, ku beriya niha bi awayekî akademîk û zanist kêm kar li ser hatiye kirin ..." û dibêje ku: "Demeke dûr û dirêj e muzîka kurdî di bin desteserkirin, qedexekirin û nemanê de bû, xweşbextane ku îro ro heta radeyekê azad e û dema wê yekê hatiye ku li cîhanê jî serî hilde û dirûv û şêwaza xwe derxe, lewma venivîsandin û komkirina muzîka folklorîk ne tenê bo arşîvkirinê pêdivî ye, jê bêtir bo geşkirin û pêşkêşkirina muzîka gelan gellekî giring e û mirov di karê wekî havên di berhemên nû de bi kar bîne ...".

Her wiha Enistîtuya Kelepora Kurdî jî di vê derbarê de di pêşgotinê de dibêje : "Li ser erka enistîtuyê ji bo parastina kelepor û zargotina gelê me, vê carê bi hevkariya folklornas Salihê Heydo, va ye komek awaz û tekestên resen yên din hatin çap û belavkirin, bi hêviya ku hunermendên kurd û gelên din bikaribin ji genciya muzîka kurdî para xwe hilînin ...".

Di vê derbarê de pêwîstî gotinê ye ku Enistîtûya Kelepora Kurdî li Herêma Kurdistanê karê xwe bi rêvebiriya hunermendê kurd yê bi nav û deng mamoste **Mezherê Xaliqî** bi alîkariya komek ji lêkolînvan û folklornas û hunermend û nivîskarên hêja û jîr kar û xebata xwe bi dilgermî birêve dibe û du şaxên wê hene, yek li Silêmaniyê û ya din jî li Dihokê. Gellek pirtûk û karên kelepûrî derxistine û bûye bingehek sereke di parastina folklor û kelepûra kurdî de ku îro ro ketiye ber windabûnê de, di vê qonaxa nû de mixabin kêm kes mane guhdanê li folklor dikin.

Mamoste Salihê Heydo jî yek ji wan kesan e ku salên dirêj ji jiyana xwe di riya lêgerîn û lêkolîn û nivîsandin û berhevkirina folklora kurdî de derbas kiriye ku karekî mezin û xebateke hêja û giranbuha di vî warî de kiriye. Ji bilî pênc dîwan helbest ku hatine çapkirin, ew jî evin: "**kêferat** 1985, **birîna kûr** 1988, **evîna welat** 1997, **serpêhatiya perîşan û meme şivan** 1985, **serpêhatiya tomazê keldanî û axayê şîrvanî** 1996" û çar dîwanên din jî ku ji çapê re amade ne. Wilo jî 54 pirtûkên li ser folklora kurdî ew jî ji bo çapê amade ne ku pêk tên ji 500 çîrok û 1500 stiran tevî lêkolîn û ravekirina wan ya dîrokî, 4000 gotinên pêşiyan, 300 metel, 100 sitiranên zarokan, 7000 wêneyên keç û jinên kurd ku ji tevahiya deverên kurdî li Sûriyê hatine berhevkirin û civandin û herwiha wî nêzîka 100 CD ji civatên folklorî li hemû deverên kurdî li Sûriyê bi cil û berg û saz û awaz û stiranên folklorî tomar kirine.


Salih Heydo

Kesekî wek mamoste **Biwar Nûredîn** ev mirovê folklornas baştir pêşkêş nekiriye, dema ku dibêje: "**Salihê Heydo bi xwe enistîtuyeke gerok e**", ji ber ko vî camêrî ne tenê ev pêmayên kurdî ji windabûnê dane hev û parastine, lê belê bi deng û awaz û dîroka wan mîna ferhengê ezber jî kirine.

Niha jî çar bergên din jî di Enistîtûya Kelepûra Kurdî de li ber çapê ne û deriyê wê vekiriye li ber Salihê Heydo, ku Mamoste Mezherê Xaliqî dibêje: "Salihê Heydo yekemîn folklornasê kurd e ku gellekî zengîn e di warê kelepûra kurdî de", ji ber vê yekê jî zû şerefa endamtiya enistîtûyê danê û kirin endam.




Salihê Heydo hatiye serdana Kurdistana Azad ji 09.02.2008an ve, ku hatibû bi mebesta beşdarbûna di Festîvala hozan û helbestvanê mezin Cegerxwîn ku di dema 10-12.02.2008'an de li Hewlêr di bin çavdêriya Hikûmeta Herêma Kurdistanê de hate lidarxistin ku bi haziriya Serokê Herêma Kurdistanê helbestek di Festîvalê de xwend.

Salihê Heydo kurê Hecî Mihemd e, di sala 1956'an de li bajarê Amûdê li parêzgeha Hesekê li Kurdistana Sûriyê ji dayik bûye û niha jî li bajarê Hesekê cîwar dibe û sernivîserê kovara **GULISTAN** e ku di sala 1968'an de Partiya Demokrata Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê derxistiye û Seydayê nemir Cegerxwîn rêvebir û sernivîskarê wê bû ta ku çû ser heqiya xwe.

www.arsivakurd.org

# Wêjevanên Kurd Li Brukselê Dicivin

Ji çar parçeyan wêjevanên kurd li Brukselê di konferansekê de tên cem hev. Konferans ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Brukselê ve tê amadekirin.

Wêjevanên kurd dê di 18-19'ê mehê li Brukselê di konferanseke bi navê "Li Brukselê Wêjeya Kurd" de bêne cem hev. Ji çar parçeyan wêjevanên wekî Şahinê Bekirê Soreklî, Hêvî Berwarî, Hasan Kaya, Ferhad Pîrbal, Konê Reş, Îbrahim Salman, Helîm Yûsiv dê di konferansê de amade bin. Wêjevan roja 18'ê mehê pêşî dê bi Wezîrê Çandê yê Almanyayê Bert Anciaux re bên cem hev û dûre tevî wezîrê alman dê hevdîtineke bi Komîserê Çandê yê Ewropayê Jàn Figel re hevdîtineke pêk bînen û nameyeke pêşkêşî wî bikin.

Hema roja saet 10'an de dê çalakiya bi navê "Wêjeya kurd çi ye?" li ser wêjeya kurd nîqaşê bikin. Di vê beşê de di bin rêveberiya Erwin Jana de dêwêjevanên kurd Şahînê Bekirê Soreklî, Helîm Yûsiv, Konê Reş û Hêvî Berwarî li ser wêjeya kurd, çand û zimanê kurdî nîqaşeke pêk bînin, Îbrahîm Selman, Hasan Kaya û Ferhad Pîrbal jê dê berhemên xwe bidin nasîn û ji wan parçeyeke bixwînin,

enstituya kurdî ya brukselê

Di 19'ê mehê saet 12'an de jî nivîskarên kurd dê li ser nameya ku dane Ewropayê, li ser pirsgirêka kurd û tiştên ji Ewropayê dixwazin axaftinê bikin. Di vê beşê de Îbrahîm Selman, Hasan Kaya, Ferhad Pîrbal dê li ser mijarê biaxivin û Şahînê Bekirê Soreklî, Konê Reş, Hêlim Yûsiv û Hêvî Berwarî jî dê berhemên xwe bidin nasîn û jê paragrafeke bixwînin.

Her wiha di her du şevan de jî dê hunermendên kurd Hekîm û Dilovan muzîka xwe pêşkêşî mêvanan bikin.(çavkanî:Diyarname)

**Ji bo kesên bixwazin beşdarî çalakiyê bibin:**

**Enstîtuya Kurdî ya Brukselê**
**Bonneelsstraat, 16 - 1210 Brussel**
**Tel. 00 32 02 230 89 30, Fax 00 32 02 231 00 97**
**kib@skynet.be**
**www.kurdishinstitute.be**


# Du Pirtûkên Helbestan Ên Nû

Li gor agahiyên ku Weşanxaneya Avestayê dan Agirî, vê Weşanxaneyê pirtûkên helbestan ên du helbestvanên kurd weşand, ji Başûr pirtûka **Selwa Gulî**, ji kurdên Qafqasyayê jî pirtûka **Şikoyê Hesen** weşand.


**Pirtûka "Gotinên Pêşiyên Kurda" Ya Diya Ciwan Derket**

Herwiha Weşanxaneya Xanî li Dihokê Pirtûka "Gotinên Pêşiyên Kurda" ya nivîskar û helbestvana Kurd a Rojavayê Kurdistanê, **Diya Ciwan** weşand.

Pirtûk bi zimanê Kurdî û bi herdu alfebayên bi tîpên erebî û latînî hatiye çap û belavkirin.




# Dîrokzan Cemşîd Bender Wefat Kir



Dîrokzanê Kurd Çemşîd Bender, midehek zaf bû ji ber tumura di mejîyê xwe de dihat tedawîkirin.

Mixabin dîrokzan Çemşîd Bender ji ber nesaxiya giran a xwe roja 08.04.2008'an li taxa Karşiyakayaya bajarê Izmîrê li mala xwe de jiyana xwe ji dest da.

Çemşîd Bender di sala 1927'an de li Konyayê hat dinê û navê wî yê esil Mehdî Halici bû. Di sala 1950-î de fakulteya hiqûqê ya Stenbolê temam kir. Bender di sala 1958'an de jî çû li Norwejê bicîh bû. Piştre di sala 1988'an de dîsa vegeriya Izmîrê.

Bender li ser dîrok, xwarin û kultura kurdan û Elewîyan pirtûk nivîsî û herî dawî jî pirtûkek bi navê " Şopa kesayetên ji dema Selçûkiyan heta dema me" nivîsî bû.

# Berlîn Dîsa Dibe Mekeya Filmên Kurdî

Piştî serketinên di salên buhurî de, Festîvala Filmên Kurdî îsal jî li Berlînê li dar dikeve. 24.05.2008 ta 01.06.2008 dê li komek ji sînemayên Berlînê hejmareke mezin ji filmên kurdî û yên li ser Kurd û Kurdistanê bêne nîşandan. Ji Kurdistanê û derveyî wê dê filmçêker, derhêner û lîstikvanên filman beşdarî vê festîvalê bibin. Derhênerên mîna Behmen Qubadî (Halfmoon), Hiner Salîm (Dol), Hîşam Zaman (Vinterland) û Yüksel Yavuz (Close-up Kurdistan) dê li Berlînê filmên xwe pêşkêş bikin.




www.arsivakurd.org

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com



## Di Dewleta Nû A Îspanyayê De, Pirraniya Wezîran Jin În



Piştî ku di hilbijartina meha borî a Parlemana Îspanyayê de, Sosyalîst ser ketin, roja înê, 11'ê Nîsana 2008'an, bi dengê nûnerên Parlemanê **Xuzê Loyîs Rodîrgz Zapatêrû** wekî Serok Wezîrê nû ê vî welatî hate hilbijartin. Xuzê Loyî dewleta nû a xwe nasand û bo cara yekemîn hejmara wezîrên jin, bêtirî wezîrên mêr e.

**Karmê Çakon** yek ji siyasetvanên mezin ê Partiya Sosyalîst a Îspanyayê weke Wezîra Parastinê hate diyarîkirin ku eva bo cara yekemîn di dîroka vî welatî de ye ku jinek dibe Wezîra Parastinê. Di dewleta nû a Îspanyayê de, 9 wezîrên jin û 8 wezîrên mêr cih girtin ku Xuzê Zapatêrû vê yekê bi wekheviya zayendî dizane. Cihgirê Serok Wezîr jî jin e. Bo cara yekemîn wezaretek bi navê Wezareta Wekheviyê hatiye avakirin ku berpirsiyariya wê li stûyê jinek 31 salî bi navê **Bîbyana** ye ku wezîra herî ciwan a dîroka Îspanyayê ye.

## Li Kurdistana Başûr Jî Madeyên Hişber Tên Kişandin



Malpera "PUKmedia"yê daxuyaniyeke çapemeniyê a Hêzên Asyiş (Ewlekarî) ên bajarê Silêmaniyê weşand û diyar kir ku Hêzên Asyişê girûpek girtine ku mijûlê belavkirina madeyên bêhişker di wî bajarî de bûne. Daxuyaniya han eşkere dike ku 11 kîlo madeyên sirker hatiye girtin. Hêzên Asyişa Herêma Kurdistanê di daxuyaniya xwe a çapemeniyê de da xuyakirin ku madeyên bêhişker di nava ciwanan de tê belavkirin. Hêjayî gotinê ye ku çend sal dibe Komara Îslamî a Îranê Tiryak û madeyên din yên hişber dişîne bo nav axa Herêma Kurdistanê û heta niha çendîn kes û girûp ji ber vê yekê hatine girtin.

## Ji Ber Barîna Kêm, Rêwas Li Kurdistanê Hindik În



Rêwas, giyayeke kesk û tamxweş a demsala biharê ye ku li çiyayên Kurdistanê gellek şîn dibe û biharan li çiyayan pirr tê dîtin. Ji ber ku îsal berf û baran hindik barî, Rêwas weke xwarineke xweş a biharê bi kêmî tê dîtin. Ev giyaye bi awayên xavî û patî tê xwarin û bikaranîn. Kêmbûna Rêwasên tirş û şirîn ên çiyayên Kurdistanê xelk nigeran kiriye û kom kom xelk bona jêvekirina Rêwasan diçin çiyayan.

Li bajarên Kurdistanê jî Rêwas wekî salan nahên dîtin.

Rêxistina Neteweyên Yekbûyî:

## "Di Sala 2007'an De, 6 Hezar Kes Bi Sedema Teqîna Mayînan Bûne Gorî"



4'ê Nîsana 2008'an, sêyemîn salvegera diyarîkirina Roja Cîhanî a Hişyarkirin derheq Mayînan û Piştgirî ji kar û Çalakiyên Mayînên Dijî Kes e. Bi vê hencetê Neteweyên Yekbûyî raporek weşand û bal kişande ser vê yekê ku di sala 2007'an de, 6 hezar kes bi sedema teqîna mayînan bûne gorî. RNY di rapora xwe a îsal de balê dikişîne ser vê yekê jî ku serbarê vê çendê ku bizaveke mezin a alîgirên mafê mirovan û navend û rêxistinên aştîxwaz û mirovhez û herwiha saziyên nedewletî ji bo vê pirsgirêka navneteweyî di seransere cîhanê de daye destpêkirin, lê hêj mayînên dijî kes û bikaranîna wan arîşe û pirsgirêkeke navneteweyî ye û destnîşan dike ku mayînên sererd û binerd di salê de dibin sedema kuştin û siqetbûna zêdetirî 20 hezar kesan û aliyê kêm yek ji pênce a van goriyane zarok û jin in.

Îran bi 16 milyon mayînan, duyemîn welatê cîhanê ye ku herî zêde mayînên çandî tê de hene. 4 parêzgehên Kurd ên Kurdistana Rojhilat (Azerbaycana Rojava, Kurdistan, Kirmaşan û Îlam) tevî parêzgeha Xozistanê -piraniya akinciyên vê Ereb in- hejmara herî zêde a mayînên çandî ên dijî kes û madeyên neteqiyayî ên Îranê li xwe girtine ku hemû rojê goriyan digire.

## Xelkê Gundê Qadirmerz Civata Xwebirêvebirina Serbixwe Ava Kirin




Heyamekê berî niha xelkê gundê Qadirmerz ku ketiye 17 kîlomteriya bajarê Dêgulanê û xwediyê dîrodkekî 400 salî ye, di gavekî bêmînak û îroyîn de, civata xwebirêvebirinê pêk anîn.

Di gundê han de 86 malbat akincî ne û bi giştî 470 kes rûniştvanên wî gundî hene.

Her wiha bi dehan malbatên vî gundî ber bi bajarê Dêgulanê, Sine û Qurwê koç kirine ku di nava wan de pitir ji 150 kes karnas û karnasên bilind û doxtor tên dîtin.

Xelkê gundê han bi hevkarî û hevbîrî tevî xwendekarên xwe bona pêşvebirina gundê xwe û perwerdekirina zarokên xwe, civata xwebirêvebirina serbixwe ava kirine.

Hêjayî gotinê ye ku akinciyên vî gundî, çend rojan berî niha sêyemîn civîna xwe bi beşdariya 200 kes ji xelkê gund û xwendekaran lidar xist.

Heya niha civata han pirtûkxaneyeke mezin û malpereke înternetî bi navê Qadirmerz ava kirine û 4 milyon tûmen hevkariya aborî ji bo xwendekaran kom kirine.